


Zanîngeha Mardîn Artûklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî



PROJEYA LÎSANS A BILIND A BÊTEZ
BANDORA PSÎKANALÎZÊ DI ÇÎROKA *MÊRÊ DIYA MIN* A MEM
ZÎNISTANÎ DE

KÛBRA ÖZEK BAVLÎ

15721062

ŞÊWIRMEND

MUSTAFA ÖZTÛRK

MÊRDÎN-2018

Kurte

Ev xebat dixwaze di çîroka "Mêrê Diya Min" a Mem Zînistanî de bandora psîkanalîza freudyen vekole. Psîkanalîz ku di heman demê de perspektîfêke psîkolojiyê ye li ser edebiyatê jî xwedî bandoreke berbiçav e, herçend psîkanalîz bêtir di edebiyatê de weke metodeke rexneyê jî tê bikaranîn lê di vê çîroka Mem Zînistanî de em ê bidin nîşandan ku çawa li ser pêvajoya nivîsandina çîrokê bandor kiriye. Ev xebat çîroka Mêrê Diya Min û kompleksa Odîpal a Sigmund Freud berawird dike û dixwaze bandora psîkanalîzê li ser çîrokê destnîşan bike.

Peyvên Sereke: psîkanalîz, kompleksa odîpal, çîrok, sigmund freud

Özet

Bu çalışma Mem Zînistanînin Mêrê Diya Min adlı öyküsünde Freudyen psikanalizin etkisini incelemeye çalışmaktadır. Psikanaliz her ne kadar bir psikoloji yaklaşımı ise de edebiyat üzerinde de belirgin bir etkisi bulunmaktadır. Her ne kadar edebiyatta bir eleştiri yöntemi olarak değerlendirilse de Mem Zînistanînin bu öyküsünde öykünün yazım sürecine nasıl etki ettiğini görmekteyiz. Bu çalışma, Mêrê Diya Min öyküsü ve Sigmund Freud'un Odipal Kompleksini karşılaştırmakta ve psikanalizin bu öykü üzerindeki etkisini göstermeyi amaçlamaktadır.

Anahtar Sözcükler: psikanaliz, odipal kompleks, öykü, sigmund freud

NAVEROK

KURTE.....	2
ÖZET.....	3
DESTPÊK.....	5
1. PSÎKANALÎZA FREUDYEN.....	6
1.1.ÇARÇOVEYA PSÎKANALÎZÊ	6
1.2.MÎTA OÎDÎPUS Û KOMPLEKSA ODÎPAL	7
2. ÇÎROKA MÊRÊ DIYA MIN Û KOMPLEKSA ODÎPAL.....	8
ENCAM.....	13
ÇAVKANÎ.....	14

Destpêk

Psîkanalîz di destpêkê de weke perspektîfeke psîkolojiyê derketibe holê jî îro weke dîsîplînek serbixwe li ser zanistiyên civakî û beşerî, hûner, edebiyat, zimanzanî û sînemayê xwedî bandoreke mezin e. Sedema bandor û berbelavbûna psîkanalîzê helbet girêdayî kifşa der-hişê ye. Ravekirina mekanîzmaya xebitîna rûhî de kişfa derhiş şoreşek pêk anî û şeweya ravekirina xebitîna rûhî guherand. Ev yek jî fehma mirovî û însanê guherand. weke metodeke analîzê îro di gelek qadên cûda de tê bikaranîn, di wêjeyê de jî ev rewş berbiçav e. Nirxandina berhemên edebî de psîkanalîz weke metodeke girîng û fonksiyonel derdikeve pêşberî me.

Psîkanalîz weke metodeke analîza berhemê tê bikaranîn ligel vê hin caran psîkanalîz di pêvajoya nivîsandina berhemekî edebî de jî bandorê dike. Ev yek xwe di pirtûka çîrokan a Mem Zînistanî de baş dide de. Di pirtûka *Bindarûk* a Mem Zînistanî de çîrokên bi vî rengî hene ku em di dibînin çawa psîkanalîz li ser pêvajoya nivîsandin û afirandina çîrokan bandor kiriye.

Di vê xebatê de em ê bandora psîkanalîzê li ser pêvajoya nivîsandina çîrokê çawa ji ser çîrokeke Mem Zînistanî analîz bikin. Emê hewl bidin û destnîşan bikin ku nivîskar çawa ji teoriya psîkanalîza Freudyen sûd wergirtiye.

Çîroka *Mêrê Diya Min* a Mem Zînistanî weke çîroka kompleksa odîpal derdikeve pêşberî me. Pevçûna di navbera kur û bav weke pevçûna di navbera bav û kurik ya serdema fallîk a zarokan e. Freud di avabûna nasnameya zayendî û kesayetî de kompleksa odîpal xwedî roleke navendî ye. Di vê çîrokê de pevçûneke di asta nevrozê dederdikeve pêşberî me û dibînin ku seranserê çîrokê di bin bandora teoriya psîkanalîza Freudyen de ye.

1. Psîkanalîza Freudyên

1.1 Çarçoveya Psîkanalîzê

Sigmund Freud wek psîkyatrîstek pêşî bûyerên ruhî di qada hişê de sînor dikir û dixwest wan bi pêvajoyên fizîkî û norolojîk rave bike. Lê demek şûnde dît ku ravekirina bûyerên ruhî de mekanîzamayên fizîkî têr nakin, ev yek rê li ber keşfa psîkanalîzê vekir. Psîkanalîz xebatên li ser nexweşên hîsteriyê derket holê- Anna O.- têgeha derhiş ku ew bingeha teoriyê bi xwe ye yekem car 1895ê de di raporek de ji aliyê Sigmund Freud ve hate bi kar anîn û di berhema Şîroveya Xewnan de cihê xwe qewî kir. (Schultz & Schultz, 2007, r.584-586)

Psîkanalîz weke dîsîplînek rasterast bi jiyana Freud ve girêdayî ye. Dîsîplîn bi veguherîn û geşedana entelektual a Freud tim veguheriyê û term û têgehên cihê lê zêde bûne. Ligel vê yekê hemû berhemên Freud, yên destpêkê jî tê de, ji bo lîteratura psîkanalîz çavkaniyên sereke ne. Ji bo ravekirina têkiliya mît û derhişê de di destpêkê de divê em bi gelemperî psîkanalîzê rave bikin. Freud di amûrê psîşîk de behsa du strukturan dike ku ew her du bi hev re bi awayekî senkronîze dixebitin ya yekem teoriya topografîk e ji hiş, pêşhiş û derhişê pêk tê. Ya duyem teoriya strukturel e ji îd, ego û super ego pêk tê. Çavkaniya her du yan jî ajo ne, ajoyan Freud wan weke Eros û Thanatos binav dike. Eros û Thanatos du ajoyên dijberên hev in yek ajoyê cînsel/jiyanê ye -Eros- ewê din ya mirinê/agresyonê ye -Thanatos-. ajo bi rêya dixwaze bi rêya amûrê psîşîk bigihêje armanca xwe, meyla ajoyan ber bi objeyek heye dixwaze bi wê objeyê. Li gor teoriya strukturel di destpêkê Îd hemû jiyana mirov -amûrê psîşîk- pêça ye, Îd li gor normên presîba *hazê* tevdigere, bi ajoyên ku dixwazin tetmîn bibin tije ye, bebek nikare ajoyên xwe taloq bike an jî kontrol bike, dema birçî be tê têrkirin, westiya be tê razandin çî bixwaze bidest dixê. Bi pêvajoya geşedana mirovan ego û superego jî ava dibin. Ego di navbera îd û jiyana derveyî de navbeynkar e. Li gor jiyana derveyî xwestekên îdê yên girêdayî ajoyan taloq û organîze dike. Freud têkiliya îd û ego dişibîne têkiliya hesp û siwarê wî, siwar hêza hesp kontrol dike û wî beralî dike ligel vê hereket girêdayî îdê ye. Ego li gor normên prensîba rastiyê tevdigere. Ji bo ajoyan ego fonksiyonek tetbîqker bi cih tîne. Ego îd ji talûkeyên dinyaya derve diparêze û presa ajoyan ji holê radike. Struktura sêyem super ego ji nîrxên ehlaqî, qedexe û standartên dê û bav pêk tê. Super ego weke encama çareseriya kompleksa odîpal derdikeve pêşberî me. Piştî arezûyên zayendî yên

li hember dê û bav dema ji holê radibe û cihê wan de zarok xwe bi wan wekîhev dike superego pêkhatina xwe temam dike(Freud, 2014, r.81-87; Tükel, 2014, r. 68-79).

Di teoriya topografîk ya Freud de sê hêman hene, derhiş,hiş û pêşhiş. Der-hiş, ji aliyê naveroka ruhî ve hatiye sazîkirin bi taybetî jî naverokên ruhî ên ku ji ber presyonê(tepeserîkirin) nikarin sansurê derbas bikin. Li gor Freud naveroka der-hişê ji dizaynên ajoyan pêk tînin, ajo nikarin derkevin qada hişê bi rêya dizaynan di der-hişê de cî digirin. Derhiş di xewnan de, jibîrkirinan de, şehîtnan de, mît û çîrokên civakî de xwe dide der. Hiş dema niha ye ango lehzaya ku em dijin hiş îfade dike, pêşhiş ji naverokên ku bi temamî ne hatine tepeserîkirin pêk tînin. Bi temamî derbasî derhiş nebû ye û bi temamî ne di hişê de ye(Tükel, 2014, r. 72-73).

1.2.Mîta Oîdîpus û Kompleksa Odîpal

Mîta Oîdîpus ku di heman demê de weke tragedya hatiye nivîsîn wiha ye. Oîdîpus kurê qral Laios e, bavê wî gunehêke mezin dike û tê lenetîkirin li gor wê lanetê dê rojek kurê wî mezin bibe û wî ê bikuje. Qral Laios piyên kurê xwe bi werîs girê dide ferman dide alîkarê xwe da ku wî bibin di nav daristanekî bihêlin lê alîkarê wî bi ya wî nake û Oîdîpus dide şivanekî da ku mezin bike. Şivan, Oîdîpus diyarî dide qralê Corinthê, qral û qralîçe Oîdîpus weke zarokên xwe mezin dikin. Di şahînetekî de yek weke zirkur lê dinêre, dixwaze rastiye hîn bibe ji dê û bavê xwe dipirse lê her du jî înkâr dikin diçe ba kahînekî,ew jî wî ji serê dişîne û jê re pêşeroja wî dibêje; Oîdîpus wê bibe mêrê diya xwe û bavê xwe bikuje. Piştî vê hîn dibe ji wê derê direve, careka din wê neyê wê derê jî. Di rê de rastî zilamekî pîr tê ji ber nîqaşa derbasbûna erebeyan nîqaş dikin û Oîdîpus di cî de wî û hemû şahîdan dikuje. Diçe û dihişê bajarê thebaiyê li wê derê sfenksê mûsallatê gelê bajar bûye. Sfenks li ser rê pirsek dipirse û eger ew kes bersiv nede wî di cî de wî dikuje. Gelê bajar di agorayê de tînin ligel hev ji bo çareseriyek û bersivê ji bo vê peyda bikin û biryar digirin ku kî wan ji sfenksê xelas bike wê wî bikin qralê xwe. Dema Oîdîpus ji wir derbas dibe sfenks pîrsa xwe jê jî dike, Oîdîpus bersiva rast dide û sfenks xwe dikuje. Gel bi kêfxweşî wî dikin qralê xwe û bi qralîçeyê ku bî mabû re dizewicînin. Şûnde li bajar veba belav dibe û kahînek dibêje sedema vê vebayê gunehkarekî bajarê ye, divê wî ji nav bajar derxin. Oîdîpus kujerê Qral Laios digere. Kahînek jê re dibêje ew kesê ku qral kuştîye ew bi xwe ye. Oîdîpus têdigihêje ku zilamê pîr ku li ser rê

kuştibû qral Laios e. Piştire hîn dibe ku ew kurê wî bi xwe ye û bi dêya xwe re zewicî ye. Kehanet bûye rastî. Oîdîpus çavên xwe kor dike û dikeva nav kolanan diya wî xwe di odê de xwe dadileqîne.

Freud di ravekirina teoriya psîkanalîzê de gelek caran ûnsûrên mîtolojiya Yewnanan bi kar aniyê- Eros, Thanatos, Electra, Oedipous, Narcissus-. Li gor Freud kompleksa odîpal di serdema fallîk a zarokan de komplekseke ku ji aliyê zarokan ve divê were çareserkirin. Di wê serdemê hezkirina zarok ligel dayika xwe heye, wekî din têkiliyek di navbera wî û bavê de heye ku dixwaze bibe weke wî ev her du hest ligel hev diçin lê piştî ku hezkirina dayik zêde dibe êdî ev yek ne mimkun e. Ev yek bo zarok kompleks e, zarokê ku heta wê hingê bav model digirt, êdî weke dijmin li bav dinêre. Dixwaze bikeve dewsa bavê xwe û bi diya xwe re be. Li hember bav hestên wî vediguhere ambîvalansê -di heman demê de hestkirina du hestên dijberê hev-. Kompleksa odîpal bo tetmînê du îhtimal pêşkêş dike; aktîf û pasîf. Di îhtimala yekem de zarok bi stîleke maskulen dixwaze bikeve dewsa bavê xwe bi dayika xwe re bikeve têkiliyê, ya duyem de dixwaze xwe bixe dewsa dayik da ku bav jê hez bike. Zarok ji kompleksa odîpal bi tehdîta kastrasyonê(xadimkirin) ya dê û bav dertê, ew kêma zêde fam dike ku pênis di têkiliya zayendî de rolê dileyze, ji bo ev amraz ji destê wî neçe hestên xwe yê li hember dayik deseksualîze dike hestên wî yê li hember dayik dibe hezkirinek notr, dibe hezkirineke saf. Xwe bi bav re wekhev dike û maskulanîte xurttir dibe. Bi vî awayî kompleks tê çareserkirin. Qedexaya enesestê ji aliyê zarok ve tê pejiandin, çareserî bi xwe re çêbûna super egoyê jî tîne. Freud kompleksa ku nehatiye çareserkirin weke bingeha nevrozî dibîne(Akvardar, 2010, r.95-98).

2.Çîroka Mêrê Diya Min û Kompleksa Odîpal

Çîroka *Mêrê Diya Min* di pirtûka Mem Zînistanî ya bi navê *Bindarûkê* de hatiye weşandin pirtûka bindarûk ji deh çîrokan pêk tê û Mêrê Diya Min çîroka dawî û herî dirêj ya pirtûkê ye. Ji aliyê teşeyê ve çîrok dişibe şanoyê. Freud ji bo kompleksa odîpal rave bike ji tragedyaya Sofokles a bi navê Kral Oidipus sût werdigire, heta serkarakterê vê tragedyayê navê xwe dide kompleksê, nivîskar ji aliyê teşeyê ve çîrokê weke tragedyayekî saz kiriye ku bandora çîroka Oîdîpus ji destpêkê ve xwe diyar dike.

Di teoriya geşedan a psîkoseksuel a Freud de du merhaleyên sereke û binbeşên van hene: Merheleya saf-erotîk û merheleya hetero-erotîk. Merheleya saf erotîk di nava xwe dibin du beş ;merheleya anal û ya oral.

a-)Merheleya Oral: Ev merhele ji nîvê sala ewil ya jiyanê pêk tê. Di vê merheleyê de zewq bi mijandinê pêk tê.

b-)Merheleya Anal: Ev merhele di navbera salên 2 û 4-5 an de ye. Çiqas diçe zarok bi awayên curbicur tê xweyî kirin, zarok divê roviyên xwe bi awayekî paqij bike û xwe rehet bike.

Merhela hetero-erotîk jî dibin sê beş; merheleya Fallîk- an jî serdema fallîk-, serdema veşare û meheleya genîtal (Charrier, 2014, r.61-80). Kompleksa odîpal di serdema fallîk de derdikeve pêşberî zarokan û di avakirina kesayetî û nasnameya zayendî de xwedî roleke navendî ye. Kompleks di esasê xwe de ji ber du-hestîbûnê derdikeve holê zarok ji aliyekî ve hemzayendê xwe rol-model digre û jê hez dike ji aliyê din wê/wî reqîb dibîne û jê nefret dike. Di çîroka *Mêrê Diya Min* de du-hestîbûneke(ambivalence) bi vî rengî dernakeve pêşberî me. Leheng ji bavê xwe tenê nefret dike.

Lehengê çîrokê Bêzar biqasî heşt salan e ji bajarê malbavana xwe bi dûrketiye, li bajarekî din dijî. Ji roja ku ji malbata xwe cuda bûye û pê de bi tene bi rêya tîlefonê û bi du yan jî sê salan carekê di eydekê de bi rêya mêvandariya rojekê yan jî du rojan bimalbatê re dide û distîne. Bêzar ji zaroktiya xwe û pê ve ti carî bi bavê xwe re li hev nekiriye. Her tim ji wî aciz bûye, her rikê xwe kutaye wî. Gava ku dibihîze bavê wî li bersikratê ye, ne bi deste xwe be jî, radibe tê dîtina wî. Ev bi qasî çend salan e nehatiye serdana malbata xwe.

Di destpêka çîrokê de tîkiliya di navbera bav û kur ji aliyê yekî din ve tê ziman em derbarê rabirdûya tîkiliya bav û kur de dibin xwedî agahî. "*Kê dîtiye ku kur li dijî bavê xwe serî radikin. Yanser e kurê te, yanser...Qey nayê bîra te, dayê, ji bavo re her tim digot, desthilatdarî.*" (Zînistanî, 2015, r.98) Bav di heman demê de bo me otorîteyê jî temsîl dike, du sekn dibînin em li vê derê a yekem sekna kurê duyem e ku em dibêje li hember bav divê tu kes raneweste û serî li hember bitewîne ya duyem jî ya Bêzar e ku ew li dijî bav radiweste. Ev yek di heman demê de sekna her du birayan a li hember otorîteyê ye.

Ji bo Bêzar bavê wî ne bav e mêrê diya wî ye ku ew jê hez dikir. "*Min ê tu divêrewşê de jîbidîtayî (Dike bibêje, bavo, belam zimanêwînagere) ba...,mêro.*" (Zînistanî,2015,r.101) li vê derê em mesafeya di navber a bav û kur dibînin. Wekhevbiyîn (özdeşleşme), di pêvajoya pêşveçûyîna kompleksa oîdîpusê de rol digire; kurikê biçûk ku bi bavê re tîkiliyeke taybet

daniye, di pêşerojê de dixwaze bibe weke bavê xwe, ji her awayê ve dixwaze cihê bavê xwe bigire. Em dikarin bêjin ku bavê xwe ji bo xwe model digire, weke fîgurekî îdeal dibîne (Freud, 2014, r.53) Lê bereksê vê di çîrokê em kompleksêke çaresernebûyî dibinîn. Li ser mînak girtinê çend nimûneyên din jî hene di çîrokê de ku zarok dixwaze bikeve dewsa bavê xwe. Bav weke model nakeve pêşberî me, zarok raseterast dixwaze bikeve dewsa bavê xwe. Ji ber ku bav weke fîgurekî pozîtîf dernakeve pêşberî me. "*Min her tim rik kuta bû riyê te jî, min dîsa jî cilêta te bi dizîka hildida û riyê xwe yê hêli ser riyê min zîl venedayî kur dikir. Min hewl dida ku ez nola te xweyî rî û simbilên gurr bim, belam hemû hewldanên min têk diçûn û ez bi ser nediketim.*" (Zînistanî,2015,r.107) "*Min bi seatan li bera wêneyê xwe pîzeve dikir û porê xweyê çûr nola pora te şeh dikir. Min bi boyaxa kekê xweyê ku diçû dibistanê biskên xwe mîna yêngên te hetanî keviya hinarikên xwe dirêj dikirin.*"(Zînistanî,2015,r.112)

Hemû tevgerên bav ji bo zarok weke tevgerên dijminane xuya dikin. Tevgerên hezkirinê yê bav jî bo daxwaziyên wî yên neqebûlkirî weke cezayêke tê dîtin. "*Dema ku ez hêj zarok bûm, te ez davetime erdê, zikê min tazî dikir û çenga xwe ya ku bi riyê te yê dirrî ve dişibiya xarên zivir li ser goştê min digerland. Dema ku riyê te di canê min de diçû, ez digidgidîm û dikeniyam.*" (Zînistanî,2015,r.106)"*Wê hingê, eşqa te pir dihat û hîrehîr bi te diket, lê belê ez diêşiyam. Te nizanibû ku di wan deman de rikê min çiqasî li riyê te yê bijî biîjî û kene te yê bindoq dihat. Lê belê, min qet xwîn ji xwe bernedida wan çaxan"* (Zînistanî,2015,r.106)."*Te tê derne dixist ku, ez gava ku mezin dibûm, min li gel ruh û canê xwerik û dijminayiya xwe jî di nava giyanê xwe de mezin dikir"*(Zînistanî,2015,r.106-107). "*Dema ku te dikira bi riyê xwe zikê min qul bikî , min bi lepên xwe radihişt ser û çav û guhên te û min ew mehkem diguvaştin. Tê bîra te, bêriya çend salan, wê çaxa ku min biryar girt ku ji we veqetim û herime dûrayiyan, te hildabû gotibû: "Tu dema biçûk bûyî jî wiha yanser bûyî. Te rûyê min fena ku heyfa xwe hilîni, dida ber pencerûkan."* Min jî wê hingê gotibû: "*Ew giş henek bûn.*" Lê belê ez îro li rûyê te dikarim mikur bêm ku barike ew ne henek bûn, mêro. "(Zînistanî,2015,r.108)

Di kompleksa odîpal de ji aliyekî ve ji bo kur bav model e û ji aliyekî din ve jî bav weke dijmin tê dîtin. Hin caran ev nefret digihigêje asta xwestina kuştina bav, da ku astengiya di navbera xwe û dayika xwe ji holê rabe. Di çîrokê de objeya nefretê bav e û kur dixwaze wî ji holê rake. Zeîfbûn û nexweşiya bav kêfa wî tîne, di serdema fallîk de bav sembola hêzê ye û zarok di wê baweriyê de ye ku tu car nikare vê hêzê ji holê rake, zarok ango *Bêzar* ji bêhêziya bavê xwe tetmîn dibe. "*Bêzar,(Wekî ku ne di nava wan de be. Bi bavê xwe re dîsa ketiye nava şerekî giran.)"Qablo û xortimên ku li cendekê te gerandine fena lavlavkên çilmisî dixuyîn.*

Xortimek şîşî mile te kirine, yek bi mûziya te ve girê dane û mîza te di tûrikekî neylon de dicive hev û yeke din jî bi seriyekî bi tupê oksîjenê ve girê dane, seriye din jî ajotine bêvila te. (Weku tinazên xwe bike, çend caran di ber xwe de bi bêhn berdanê re denge xwe weke kenekî bi pistepist derdixe.) Bêvila te weke popileke berbijêrê ve daketî ya dîkekî bi çomelanê ketî dixuye. Tu dîkî, ne, teqlebaz î, herê? (Di ber xwe de hêdîka dikene.) Va ye, nexweşiyê malik li te xerab kiriye û tu basko kiriyî, mêro." (Bêzar di zaroktiya xwe de kew xwedî kiribûn.) (Zînistanî,2015,r.104-105)" Na, ez ê mirina te bi çavê serê xwe bibînim, bavo. Heke na, ez ê ti carî haşt û aram nebim. Gotî giyanê te yê genî bidî çavên min biterikîne cendekê te yê tîrr tê de hişk bûyî." (Zînistanî,2015,r.115) Lelê, tika dikim, min ji vê şadûmaniyê bê par mehêle. Bihêle ku ez mirina wî bi çavên serê xwe bibînim. (Zînistanî,2015,r.115-116)

Li ser kuştina bav Freud di pirtûka xwe ya Totem û Tabûyê(1971) de behsa teoriya Darwîna yekem grûba însan dike. Di yekem grûba yekem a însanan de bavek hebû, hemû jin yên wî bûn, zarokên ku hinek mezin dibûn ji aliyê bav ve dihat qewirandin. Rojek zarokên ku ji grûbê hatibûn qewirandin digihêjin hev bavê xwe dikujin û goştên wî jî dixwin. Yekûyek nikarin vê yekê lê bi hev re serdikevin. Birayên kujer bavê xwe dihesidîn û jê ditirsiyan lê piştî goştê wî xwarin ew jî bûn weke wî, bi xwarina goştê wî hêz û îqtîdara wî jî kirin parçeyeke xwe. Lê ligel nefretên xwe zarok ji bavê xwe hez jî dikirin piştî kuştina bav nefreta wan tetmîn bû ketin poşmaniyekî. Cihê bav de totemek îqame dikin û kuştina vê totemê qedexe dikin, cînayet bi vî awayî tê temîrkirin. Qedexeya têkiliya enestê dîsa wê demê tê afirandin. Da ku bi hev re bijîn mecbûr bûn vê qedexeyê deynin. Baweriya totem ji poşmaniya birayên ku bavê xwe kuştin derketiye holê bi vî awayî ew rihên bavê dixwestin aş bikin(Freud,1971,r.204-213). Jiholêrakirina bav îmkana bidestxistina jineke dide zaroyan û ev di heman demê ji holê rakirina otorîteyê qedexekar e jî. Psîkanalîst Bülent Somay di hevpeyvîneke xwe de diyar dike kuştina bav bo azadî û serxwebûnê ferziyeteke, bes kuştin na divê piştî kuştinê goştê bav jî were xwarin bi vî awayî îktîdara ku dihundirîne dibe parçeyeke wê/wî kesê bi xwe. Ji ber ku li rojava bav hatiye kuştin û goştê wî hatiye xwarin mirov rizgar e lê li Rojhilat em nikarin behsa vê yekê bikin(Somay,2015).

Di serdema fallîk de dema zarok dibe şahidê têkiliya zayendî ya di navbera dê û bav di hizre ku bavê wî êrîş li diya wî dike wê diêşîne. Ji bo zarok ev rewş xerabiyeyeke bavê ye li hember dayik. Ev yek ji bo zarok hin caran vediguhêze travmayekê di çîrokê hin beşan de ji aliyê lehengê ve ev yek tê ziman. *Ev desten ku îro hizhişt ne, bidî çavên min dêya min hindik mizdan, hindik rapêçan, hindik kutan? (Zînistanî,2015, r.109) Dema ku dêya min ji mirinê difilitî, ji ber ku sere te seba lêdanên di pêşerojê de bikêfan melomestî dibû, di orta te û xwedê*

de bihustek nedima. Te bi van destan ve bedena lele bi şev bi mizdanê, bi roj bi lêdanê dirizand. (Zînistanî,2015,r.110) *Heta roja îro te di dêya min ve rada, belam îşev ez êdi diya te ve radim.* (Zînistanî,2015,r.120) Têkiliya di navbera bav û dayik tim di hedefa *Bêzar* de ye. Bav heta dawiyê çîrokê weke dijmin e, hemû tevgerên bav li gor *Bêzar* ango lehengê çîrokê bi niyeteke xerab in.

Kompleksa Odîpal bi rêya qebûlkirina otorîteya bav tê çareserkirin, zarok bavê xwe ji xwe re dike model û hestên xwe yên li hember dayik vediguherîne. Ji bo wî bav êdî ne dijmin e, rol-model e, zarok êdî dixwaze bibe weke wî. Di çîroka *Mêrê Diya Min* de leheng li hember bav dijminatîya xwe heta dawî didomîne, tirsê berê ya li hember bav şikestî ye ji ber ku bav ne ev bavê berê ye bihêz e, bêqewet, newxweş û zeîf e. Xwesteka tunekirina bav dawîya çîrokê de dibe aksiyon. "*Ji nişkê ve, weku biryarek girtibe, çarşefê li bavê xwe dinixumîne, radihêle seromê û pîça seromê û bi ser bavê xwe de digire. Pişt re dest davêje xortoma oksîjenê û xortomê ji bêvila bavê xwe radikişîne.*" (Zînistanî,2015,r.119-120) Lê dema doktorê li nexweşxaneyê dikeve nava odê, *Bêzar* wî dişibîne bavê xwe û tirsê berê ya bavî ji nû ve diveje. *Bavo! Na, na bavo... Min tiştê nekiriye, bavo! Bavo lavayî dikim li min nexê! (Bi mebesta xwe parastinê destên xwe wekî mertal dide ber ser û çavê xwe.) Bi qurbana binê pêyên te me, bavo! Wellehî min tu nekuştî!* (Zînistanî,2015,r.127)

Encam

Çîroka *Mêrê Diya Min* ji serenav heta dawiyê çîroka kompleksa odîpal derdikeve pêşberî me, çîrok pevçûna derhişîn a zaroka serdema fallîk derdixe asta hişîn û çîrok li ser vê pevçûnê tê honandin. Her çend çavkaniya çîrokê kompleksa odîpal a Freudyen be jî çîrok ji aliyê honandinê ve ji vê rastiya psîkolojîk dûr e. Ji bo Freud ev pevçûna zarok û fanteziyên wî yên li hember dayik derhişîn in û ev yek nikare derkeve qada hişê. Dîsa li gor psîkanalîza freudyen kompleksa odîpal bi rêya tehdîta kastrasyon a bav ji holê radibe, zarok arezûyên xwe yên li hember dayik dikişîne arezûyên cinsî vediguhêre hesta hezkirinê. Piştî vê ji bo zarokê kur, bav model e, ew dixwaze bibe weke wî, helbet hin caran kompleks nayê çareserkin û arezûya li hember dayik berdewam dike wê hingê ev yek dibe sedema rewşa nevroîk ango nexweşîna psîkolojîk. Bereksê vê di çîrokê em karekerekî nevroîk nabînin, lê kur dijminatîya ji serdema fallîk didomîne. Çîrok adeta pevçûna serdemekî kurt li ser hemû jiyane belav kiriye. Karakter an jî Odîpê me yê ku nikare dayika xwe bidest bixe bi nefret û acizî ji bav dûr ketiye.

Dinyaya fiktîf a edebiyatê de helbet ne hewce ye çîrok bi rastiya zanistî ahengdar be, di vê çîrokê de em dibînin ku çawa teoriya psîkanalîzê li ser honandina çîrokeke edebî kiriye. Çîroka *Mêrê Diya Min* a Mem Zînistanî bi gelek awayan çîroka pevçûna zarok a serdema fallîk e.

Çavkanî

- Akvardar, Y. Û yê din. (2010). *Psikanalitik kurama giriş*. Stenbol:Bağlam
- Charrier, J. P.(2014). *Bilinçdışı ve insan*.(Hüsen Portakal, Wer.)Stenbol: Cem
- Freud, S.(2014).*Haz ilkesinin ötesinde-ben ve id*.(Ali Babaoğlu, Wer.) Stenbol:Metis.
- Freud,S.(1971).*Totem ve tabu*.(Niyazi Berkes,Wer.) Stenbol:Remzi.
- Freud, S.(2014). *Kitle psikolojisi*.(Kâmuran Şipal, Wer.)Stenbol:Cem
- Schultz D. P. & Schultz, S.E.(2007).*Modern psikoloji tarihi*.(Yasemin Aslay,Wer.)Stenbol:Kaknüs
- Somay, B.(2015, 16ê Gulanê). Türkiye psikanaliz divanında!. Mejûya gihanê: 25ê Cotmeha 2017, <http://www.haberturk.com>
- Tükel,R.(2014). *Freud okumaları*. Stenbol: Bağlam.
- Zînistanî, M.(2015).*Bindarûk*. Amed:Lîs